

# Xwedîtina çîroka kurdî



Omer Dilsoz

Çendîn bûyer û qewimîn zêde bibin, dilê me çendîn biêşe û derdê me giran bibe çîrokên me jî ewqas zêde dibin. Jiyan bi hemû aliyên xwe ve hev temam dike. Di qonaxên guherîn û teqlavêtina miletan de serhatî û qewimînên vî miletî jî zêde dibin.

Di her teql û heyama berguherînê de hizrên nû vedijenin û pêlên nû li civakê radibin. Di vê heyama aloz û bêserûber de ba û bagereke nû li civakê radibe; pê re jî, dirûv û teşeyê civakê tûvilê xwe nû dike; di vê serêşî û jankêşiya tûvilavêtinê de civak bi seranpê vediweje. Aso û kêrimilên civakê firehtir dibin. Hizirîna civakî dûrbîntir dibe û têgeh û ferhenga heyamê hildiweşe û hêdî hêdî ferhengeke nûjentir di zêhn û hişê civakê de ava dibe. Serpêhatî û serboriyên me jî bi wê ferhenga nû çîrokên me dixemilînin û bi vî lewnî di civakê de şêwazeke nû berceste dibe.

Heyamên berguherînê dişibin heyamên berzayînê yên jineke ducanî. Di vê heyama bi êş û jan de ruh û giyanêke nû dizê; ev ruhiyeta nû bi xwe re êş û janên nû jî tîne ku jî van êş û janan ferhengeke nû dijene. Ji vê hiljenînê term û têgehên nû, hevok û hevoksaziyeke nû dihê meydanê. Hingê bi xweber rû û dirûvê çîrok û çîrokbêjîyê jî diguhere.

Pêvajo û heyama guherînê bi serê xwe qewimîneke mezin û bi heybet e. Serpêhatî û çîrokeke aloz û rengîn e. Teql û lêkktineke jande û kovandar e. Ji ber hindê jî, di verêja vê helkefta mezin ya ku civateke gotinrês ber bi civateke nivîsrês ve gêr dibe de, tûvilê gotinê yê berbelav û nepatî, yê xav û bêpergal êdî cihê xwe ji tûvilê nivîsê yê hevrêsandî û weribiyayî re dihêle.

Kurdî di nav cîhana derbirînê de hêdî hêdî lîsê xwe datîne. Hêlîna xwe çêdike. Çîrokên vî zimanî ji nav rêzik û beytên dengbêjan derdikevin û hêdî hêdî li ser rûyê kaxizan dihêne dariştin. Bêhna hubrê bi kepê kurdan jî dikeve ku êdî xewn û xeyal, hêvî û keserên xwe bi vê bêhnê hildikêşin kezeba xwe. Îro di nivîsbariya kurdî de qonaxa nesr û pexşanê ye.

Di serpêhatî û qewimînekê de heyama berguherînê çep û fetla herî girîng e. Hemû enerjî û şiyana gotinrêsiyê ber bi nivîsrêsiyê ve diherike. Termên vegotin û derbirînê ji serî de serobin dibin û deng û pêjna zimanî di nava hev de dişiliqe. Ev teql û şiliqiyên bi serê xwe qewimîneke xweser e ku heyecaneke mezin di hest û nestên mirovî de pêk tîne. Ev heyecan kakila dengvedaneke nû ye; ji ber ku hêz û dînamîzma herî mezin a ku mirovî berev dahênan û hilberandinê ve pal dide, her ev heyecan e. Ta ku motora guherînê her ji vê heyecanê ye; heyecana ku ji heyama teşegirtina derbirînê peyda bûye.

Hingê ev heyama ku me wek 'heyama berguherînê' pênase kir, çawa ku kakil û berikê dekakekê di binê axê de dipeqe û çîl û ajên xwe berdide dilê xwe û hêdîka di malzaroka wê de dibişkive, her wisa civak jî, term û şayesên zimanê wê jî, eynî, bi şiklî dibişkivin. Ev qewimîna bişkiftinê ji ber ku sava û nexiyê wî zimanî ye, hemû xweserî û hêvênê ku ji wî zimanî meyandine, di xwe de dihewîne û dide der.

Mebesta min ji vê pênasekirinê ew e ku nîfşê bi çîrokên Memê Alan, Hemzeyê Pehlevan, Rostemê Zal, Mem û Zînê û hwd hînî melevaniya xewn û xeyalên derbirînê bûyî, êdî çîrokên xwe di pencereya serdemê de dibînin û pê re jî, qewimîn û serboriyên xwe bi destê xwe vedihûnin.

Êdî bi kurdî jî em hînî hemû vegotin û dariştina serhatiyên xwe bûne. Me jî êdî gotineke xwe heye ku bişên di dîwana cîhanê de raber bikin ku wê dîwanê heta vê gavê ji lewnê vê çîrokê qet nebihîstiye. Ji ber vê ye ku her hilpekî û vewejîna nû dengvedaneke nû jî çêdike.

Ji bo vê yekê bi dilsaxî em dikarin bibêjin ku heyama berguherîna çîroka kurdî meydanê nû ye ku di qada navmiletî de dibe egera dengvedaneke cuda. Ev jî, bi serê xwe serhatiyêke serincrakêş e ku dibe meydana çîrokeke xurt a neceribandî...

Di vê qonaxa behsê gotinê ye de, hêz û dînamîzmeke nepenî heye.

Heke qelemşorên kurdî bikaribin vê dînamîzma muthîş berceste yî nivîsê bikin û vê teql û tûvilavêtina civakê qenc bikaribin bi tevnê gotinê birêsin û wan bi ruh û giyan bixin, wê demê, çav lê ye ku ronesansa kurdî li seranserê cîhanê deng vede. Ev dînamîzm avisê şaheserên gelekî hêja û qedirşînas e.

Çîrokên serkeftî, ji serhatiyên dengvedayî yên ku di hiş û bîra civakê de bûne sedema velerzên mezin têne raçandin. Serçaviya çîrokên nemir heke dilsojî û drama civakê be, jixwe drama herî dilşewat jî her ew heyama berguherînê bi xwe ye. Ji ber hindê jî, kurdê ku ji nava sotinî û malwêraniya wê şewatê çav li dinyayê vekirine, di vê teql û helkefta berguherînê de tenê pê li birîna rojê xwe bike û bi çavekî rût û rewal li dîmenê xwe yê êşê binêre û wî dîmenî raxe ber rondikên pênivîska xwe, hingê, dê çîroka herî serkeftî ya cîhanê binivîse. Her çendîn, navê vê trajediyê gelekî sotîner be jî, ev heyam, ji bo nivîserekî/ê şansek e jî.

Ji ber ku nivîsîn bi xwe êşek e, derdek e, kulek e; ew ên ku derdekî wan heye dikarin rondikên pênivîskê bi xwîna dilê xwe vemalişin û bibin gundarê/a hemû çîrok û serpêhatiyên şikestin û têkçûnên ku dil û kezba mirovî parçe parçe dikin. Nivîsandin bi serê xwe parçeparçebûnek e, qedqedbûnek e; heke ku dilekî te yê bikaribe qed qed bibe hebe anca hingê tu dikarî hemû sotiniyên jiyane ragirî û xema nivîsê pişt bikî.

Îro pênivîskên me bi kurdî dilorînin. Bi xema nivîsê sernişîvî dol û newalên sotiniyên welatê xwe dibin; her roj, serhatiyek dibe mêvana tenêti û xerîbiya jiyana me. Her roj, em parçeyekî dî ji dilê xwe qed qed dikin û serboriyên xwe li ser dineqîşînin. Lewma çîrokên me her roj diçe mezintir dibin; bejna peyvên me bilindtir dibe, xemla hevokên me spehîtir dibe, rûyê serhatiyên me geştir dibe.

Wek encam ez dişem bibêjim ku çîroka kurdî rûyê axê qelaştîye û bişkojkên xwe hêdî hêdî li ser erdê rakişandine. Erê, ew li ber teqîneke mezin e. Ew, her roja paştir piçekî dî xwe dibîne, bi xwe dihesê û bi xwe bawer dibe, hingê jî bejna wê bilind dibe.

